

## Dr. Ezîzê Gerdenzerî

### Fikra nivîskar

”Kurmanc ne pîr di bê kemalin  
Emma di yekem û bê mecalin  
Hemin, ne cahal û nezanin  
Belkî di sêfil û bê xwedanin...”

**Ehmedê Xanî**

### *Kurdên Êzîdî yên li Ermenîstanê*

#### 1. Êzîdîyatî çîye û Êzîdî kîne?

Bi nerîna min, bi dîtina min, Êzîdîyatî dîn û hebandin, çand û felsefe, rê û risim ya wan eşîr û civakên Mesopotamiya qedîmin, ku di nav gêjgerînga, di nav aş û aşpêjxana (aşxana) mêjûyî de hel bûne, hasil bûne û wek netewa kurd derketine holê û wek netewa kurdewariyê tên naskirinê. Êzîdîyatî hem ol e, hem jî civake. Wek ol hed û seda wê heye, wek civak mîrîtiya wê heye.

Êzîdî ew kesin, yên ku dev ji rabûn û rûniştina heftê û heft govek bavên xwe bernedane, dînê kurdewariyê yê qedîm parastine, xwedî li mîrîtiya xwe, axa xwe, zîyaretên xwe derketine. Hatine kuştinê, lê nehatine rayê.

Êzîdî ew kesin, yên ku bi kurmancî tim gazî Xwedê dikan, yên ku alfabet (alfebeya) xwe di sedsala 12'an da afirandine û 40 pirtûk bi wê alfabetê nivîsîne. Lê dijmina 38 pirtûkên me şewitandin û Mîrê Qelemê, Şêx Hesênê Şêx Bereket kuştin. Piştî wê yekê kitêb û defter li êzîdîyan hatin qedexekirinê. Ew qedexekirin di sala 1918'an da bi destûra Mala Mîrê Êzîdîyan hat pûç kirinê.

Êzîdî ew kesin, yên ku tim ala sê rengîn, ala Kurdistanê, ala kesk û sor û zer, di dema oxirmê giran da, an jî di dema ahenggeriyê û şaynetiyê de hilgirtine. Wek nîmûne: Kongreya Êzîdîyan ya yekemîn di 21'ê Îlonê di sala 1920'an da li Ermenîstanê li bajarê Alêksindropol (niha Gumrî) hat lidarxistin.

Êzîdî ew însanin, yên ku bi kurmançî qewil, beyt, sîrûde, eser û berhemên xwe yên olî afirandine, bi kurmançî serê xwe û şûrê xwe girêdane, heftê û du fermanên komkujiyê ser wan da girtine, lê dîsa ewana hewa mane û hene.

Belê, Mîrê me, Mîrê Êzîdiyên Cihanê bi giştî, rêzdar Tahsin Seîd Elî Beg gotîye û dibêjê: *“Em Êzîdî kurdin û me tûcaran kurdîtiya xwe înkâr nekirîye û nakin. Heke ku em zimanê xwe yê kurdî wînda bikin, hingî emê ola xwe, Êzîdîtiya xwe, wînda bikin. Heke ku em ola xwe wînda bikin, emê zimanê xwe wînda bikin.....”*. Lêbelê, rêzdar Bavê Şêx, Bavê Çawîş, Şêxê Wezîr, Serokê Qewala û yên din jî weke Mîrê me gotî difikirin. Belê, birayê Mîr Tahsin Seîd Elî Beg û şûndarê wî; Mîr Faroq Seîd Elî Beg, di destpêka meha nîsana sala 2002'an da, li Başiqê, di quba Şêx Mehmedê Şêx Şerfedînê Şêx Hesenê Şêx Bereket da, dema ku gotûbêjekê bi 19 rojnamenûsên (rojnamevanên) Ewropî ra pêkanî, bi eşkerayî got ku Êzîdî kurdin. Ji ber ku ew dem, dema Saddamê devxwîn bû, wî di dewsa bêjeya “kurd”, “kurmanç” anî ser zimên. Kurmanç kî ne, kî nînin her kes ji me zane<sup>1</sup>.

Di dema rejîma Saddam da, êzîdî û rêberên êzîdîyan di bin zextê, di bin nîrekî giran da bûn; gûnd û bajarên êzîdîyan hatibûn wêran û kambaxkirinê, bi hezaran êzîdî hatibûn enfal kirinê, bedlê (navê) erebî li êzîdîyan kiribûn, gelek ax û milkên êzîdîyan bi darê zorê ji wan standibûn..., lê êzîdîyan baş zanibûn ew kî ne û ereba jî helbet zanibû êzîdî kî ne. Di sala 2002'an da di quba Şêx Mehmed da dibistana zimanê kurdî hebû. Êzîdî, ji xeynî hinekên ji Başiq û Behzanê, kurdî diaxivîn. Merasîm, aheng, mihrîcanên êzîdîyan bi zimanê kurdî dihatin lidarxistinê. Navûnîşanên êzîdîyên welêt yên giring Lalişa Nûranî, Bahdirî (Bahadrê), Mala Mîrê Êzîdîyan, Resmê Tawisî Melek in.

Belê, gelek simbol, navûnîşanên Êzîdîyatîyê hene, lê êzîdîyên li Ermenîstanê sembola herî girîng, simbola Şems/tavê/rojê dibînin. Li cem êzîdîyên Ermenîstanê ji cejnên êzîdîyan yên herî pîroz, Eyda Êzîd, wek cejna damezirandina ax û topraxê (cihanê), di hindava Yêzdanê Mezin da û Eyda Xidir Nebî Xidir Eylas, wek cejna miraza, tîn hesab kirinê. Êzîdîyên li

---

<sup>1</sup> Xwediyê van rêzikan bi xwe di wê civînê da hazir bû. Lawê Mîr Faroq, general Vîyan, û lawê Mîr Tahsin, helbestvan Seîd, di dema rejîma Baas da, di bûyerên veşartî da, qeza li wan qewimî û çûn ser dilovaniya xwe. Ewladên Mala Mîran, li gel gelek şêr û egîten êzîdîyan, heşt sala pêşmerge Barzaniyê Nemir bûne.

Ermenîstanê Cejna Newroz, Cejna Kuloça ya serê salê û Cejna Hêkesorê (Çarşema Sor), wek cejnên rizgarîyê, daxuliqandina însên û siriştê dibînin. Cejna Newrozê, piştî Şoreşa Îlonê bi serokatîya Barzanîyê Nemir, her sal li Ermenîstanê tê pîroz kirinê. Şoreşa Îlonê bû şoreşa xwenaskirinê, hişiyarbûnê û xweparastinê di dil û mêjûyê êzîdîyên li Ermenîstanê da. Ewana serbilindin, ku kurdin, kurdên eslî ne û gelek kar û xebat kirin û dikin ji bo xurtkirina sîyeseta kurdewarîyê, zanyarîya kurdî, ziman û wêjeya kurdî.

Di ser hîm û bingeha lêkolînên me li Pitrûkxana Ermenîstanê ya Netewî û Matênadaranê: di bingeha destnivîsarên qedîm da, di sala 2002'an da, em hatine li ser wê bawariyê, ku netewa ermenî em êzîdî wek dost û birayên xwe dîtine. Min mijarek, miqalek, destnivîsarek ya zanîyar, ûlmdar û oldarên ermenîyan nedîtîye, ku ewana xwestibin êzîdîyan ji koka wan dûrxin, ji kurdewariyê dûrxin û di nav xwe da bihelînin, asîmîle bikin. Na xêr, zanyar, nivîskar û rojnamenûsên ermenîyan tim nivîsîne, ku êzîdî kurmancin, êzîdî kurdin û li her derê hatiye nivîsandin wek kurdên êzdî û kurdên musulman. Piştî kambaxbûna, hilweşîna Yekîtîya Sovyetîstanê, di salên 1988 – 1990'an da, hinek zanîyarên ermenîyan hewl dan ku êzîdîyan ji netewa wan dûr bixin, îdeolojîya “netewa êzîdî” derxistin holê, ji bo ku faktora kurdîyê li Qawqazê û Rûsiyê da sist bikin, lê belê gelek zanîyarên ermenîyan li dijî vê nerastîyê derketin. Civaka êzîdîyên li Ermenîstanê baş zane ew kî ne, gelek keç û xortên wan li tevî refên pêşmergan, partîzanan bûne û ji bo serxwebûna axa kalûbavên xwe, Kurdistanê, berxwedanê dikin.

Herweha, êzîdî bi êtnosî (etnîsîte), bi netewa xwe va, beşek, civakek ji êtnosa (etnîsîteya, qewmê), ji netewa kurdewariyê ne. Zimanê êzîdîyan kurmancî ye, kurdî ye. Dîn û hebandina êzîdîya, Êzîdîyatî ye. Şîxadî (Şêx Adî) mîrê êzîdîya bûye. Şêx Şerfedîn mîrê dîwanê, meclisa êzîdîya bûye, ew lawê Şîxisin (Şêx Hesên) bûye, bi eslê xwe kurd bûye. Quba 40 mîrê dîwanê li ser qotê Çîyayê Şengalê ye, quba Şêx Şerfedîn li jêra wê da ye.

## **2. Koçberîya kurdên êzîdî ber bi Ermenîstanê**

Du hej û koçberî, rev û beza êzîdîyan ber bi welatê ûris, ber bi Ermenîstanê, di dîroka nû da dîyarin.

Di destpêka sedsala 19'an da, cara yekem, gelek eşîr û malbatên êzîdîyan yên ku li qeza Wanê, Bazîdê, Surmeliyê û Qersê da diman, ji ber zor û zulma osmanîyan û hinek axa û begên kurdên musulman yên ku bûbûn hacêt di destên osmanîyan da, ji refên xwe qetîyan û

xwe avêtin ber bextê xaçparêzan, berê xwe dan welatê ûris; Împeretoriya Rûsiyê, Herêma/Gubêrnîya Qawqazê.

Cara duhem di sala 1918'an da, gelek eşîr û malbatên êzîdîyan yên ku di dema komkujîya ermenîyan ya bi destî osmanîyan, li rex ermenîyan sekinî bûn û tevî ermenîyan û rûsan li dijî Roma Reş şer kiribûn, ji mecbûrî, destê xwe ji axa bav û kalên xwe kirin, di Komara Ermenîstanê da bi cî û war bûn. Di sala 1918'an da û berîya wê, mêrxasê êzîdî Cangîr Axa û mêrxasê ermenî Andranîk Paşa bi tevî şêr û egîtên xwe gelek ermenî û êzîdî ji destê zilmkarên tirk, tirkên gênc (Jön Türkler), osmanî û Roma Reş rizgar kirin.

Êl, eşîr, qebîle û malbatên êzîdîyan yên ku di qirna (sedsala) 19'an da û di destpêka qirna 20'an da li Ermenîstanê bi star bûbûn ev bûn: Zûqûrîyan, Sîpkan, Xaltan, Mehemdan, Rojkan-Rojkanî, Hesînîyan, Axalera, Belan, Anqosan, Mendikan, Mendesoran, Pîvazan, Şerqîyan, Baravan, Çuxreşan, Mîrangan, Desînîyan, Ortilîyan, Gerdenzeran û gelekên din.

Hinek ji van malbatên êzîdîyan gelekî bi nav û deng bûne, mîrîtiya wan, paşatiya wan hebûye. Di demekî da Mîrîtiya Bîtîsê di destê Rojkanîya da bûye, Şeref Xanê Bitlîsî bi eslê xwe Rojkanî bûye. Rojkanî berîya 150-160 salan li qeza Wanê diman û ji wir bar kirine hatine Ermenîstanê, nehîya Aparanê. Axê wan ji mala Çoban Axa (Kok Axa) bûye. Rojkanî û Barava Xaltî ne û berîya bûyina Îsa paşatiya Xaltîya hebûye. Paşatiya Desînîya jî di dîrokê da diyar e. Sîpkan û Hesinan jî eşîrên bi nav û deng, ewana ji qeza Qersê bar kirine, hatine û derketine Ermenîstanê. Fêrîk Polat Begê Sîpkî, di 21 salîya xwe da serokê hukûmeta ûrisa ya Sîbîryê bûye. Mala Hesên Begê di nava Hesenan de maleke bi nav û deng bûye, serê pêsekinîya bûne, xwedî gelet qedrê giran bûne, xwendin û zanîbûn hez kirine; Êsib Begê hogirê kompozîtîrê ermenîya yê meşûr Komîtas bûye, tevî wî xwendina bilind standîye. Demeke dirêj Êsib Beg wek rêberê êzîdîyan li Ermenîstanê da hatîye naskirinê. Mendikan, Çuxreşan, Reşîyan (Reşkan) li qeza Wanê mane, ji wan ra wisa jî dibên Êla Zuqûrîyan. Di nav wan da gelek mêrên qedirgiran, gewre hebûne. Yek ji wan Cangîr Axayê Mendikî bûye. Mala Simoyê Çeto Axayê Reşîyan jî maleke bi hêz bûye, dema oxirmê giran da xwe nedane paş, di erafê meydana mêranîyê de sekinî bûne.

Hinek ji van malbatan paşê barkirin çûne Gurcistanê.

Ew malbatên êzîdîyan yên li Qeza Wanê, Qersê, Bazîdê, Surmeliyê man, berê xwe nedane Ermenîstanê, an hatine kuştin, an jî dev ji dîna Êzîdîyatîyê berdand û bûne musulman.

Hejmara êzîdîyan li Ermenîstanê di sala 1890'an da 13000, sala 1925'an 14522, sala 1989'an 51900 bû.

Êzîdî li quntara çiyayê Aragasê li 13 gundên nehiya Aparanê, 11 gundên nehiya Telînê û li gundên deşta Araratê hatibûn bi cih û war kirinê.

Di sala 1918'an da di civîna netewî ya hûkûmeta Ermenîstanê da nûnerekî bi eslê xwe êzîdî hat hibijibartinê. Navê wî Ûsîb Beg Têmûriyan bû. Piştî sala 1918'an heta sala 1991'an tim wekîl û nûnerên êzîdîyan li parlamêntoya Ermenîstanê da hebûne. Mesele; Mîroyê Esed şûndarê serokê parlamêntoyê bûye. Heta 1991'an tim şûndarê wezîrekî an 2-3 wezîran yên bi eslê xwe êzîdî di wezaretê Ermenîstanê da hebûne. Piştî sala 1918'an heta sala 1991'an li Komara Ermenîstanê, ne ku tenê kurdên êzîdî û ermenî, lê wisa jî kurdên musilman û ermenî jî wek bira bûn.

Kongreya êzîdîyan ya yekem bi serokatîya Ûsîb Begê êzîdî û Lazo'yê ermenî li bajarê Alêksandropol (Gumriyê) di sala 1920'an da hat damezirandinê. Qewal Elyas, ku serokê şandeka Mala Mîrê Êzîdîyan bû, Ordêna Şemş ya li ser qeytana sê renga, hersê rengên ala Kurdistanê, rengên kesk û sor û zer va dardakirî wek dîyarîya şêkirandinê pêşkêşî Lazo kir, ji ber ku Lazo ew kes bûyê, ku dibîstan ji bo zarokên êzîdîyan, pêşîyê li Gurcistanê, paşê jî li Ermenîstanê vekir, bi tîpên ermenî zarokên êzîdî fêrî xwendina zimanê dê, zimanê kurdî devoka kurmancî dikir.

Rojname û kovarên ermenîyan yên wê demê dinivîsîn: *"Êzîdîyan ji bîr nekin"*, *"Ferqê nekin navbera êzîdîyan û ermenîyan"*, *"Êzîdî birayê me ne"*, *"Xwe nehêvîşînin ji bo piştgirîya êzîdîyan"*...

### **3. Peywendî û eleqetîyên kurdên êzîdî û kurdên musilman, ermenîyan û kurdan**

Di qirna 19'an û destpêka sedsala 20'an da ji ber sedemên cude cude, payê pirê di rûyê sedemên durûtî, fêlbazî, zordestî ya hukumdarê tirka: osmanî, tirkên gênc, rêjîma Mustafa Kemal û ên din, eleqetîyên kurdên êzîdî û kurdên musilman, ermenîyan û kurdên musilman ewqasî jî ne xweş bûne.

Di destpêka qirna 19'an da di rûyê durûtîya walîyê Mûsilê da, ku tirk bû û paşayê hukûmeta tirkan bû, mîrê Rewendûzê, Mîrê Kor, ku xwedêgiravî kurd bû, fermana komkujîya êzîdîyan lidardixê, leşker didê pêşîya xwe û diçê ku êzîdîyan ji kokê va bibirê.

Wê demê eşîra Zêbarîya, ku eşîreke kurda ya bi nav û deng e, li ser rêya eskerê mîrê Rewendûzê disekinê. Mîrê xwînxwar berê xwe didê Zêbarîyan û zêdetirî 450 ji mêrên wan dikujê û êrîşa xwe ya li ser êzîdîyan didomîne. Di Çiyayê Meqlûbê da şerekî dijwar di navbera kurdên êzîdî û kurdên xwefirotî da derdikevê.

Wê demê êzîdîyên Çiyayê Şengalê têne hewara êzîdîyên Çiyayê Meqlûbê û dibin çepera şer û egîta li ser rêya Mîrê Kor .

Gelek eşîrên kurdan yên bi ola xwe musulman; Zêbarîyan, Barzanîyan, Soranan mêhla êzîdîyan dikin û bi her alîya va alîkarîyê didine êzîdîyan.

Di xelasîya sedsala 19'an û destpêka qirna 20'an da, Alayên Hemîdîyan yên di eslê xwe da xwedêgiravî kurd bûn, lê li nav netewa kurd da ku wek cerdevan, çete, çepel, çeçel, qorîçî, cehş tên binavkirinê, ewana qira êzîdîyan û ermenîyan anîn. Paşê tirk li stûkura hemîdîyan siwar bûn, ew ji holê rakirin.

Hinek axa, beg û paşayên kurdên musulman, yên xwefiroş, di bin ala tirka da, gelek êzîdî û ermenî kuştin. Begek ji wan xwefiroşa, begekî navheram, Teyar Beg, di sala 1918'an da tê derdikevê nehiya Aparanê, ji eşîra Sîpka ne jin, ne zarok, kesî nahêvsîne, bi ecêb dikuje. Dibên çemê li nav gundê Elegezê re dikişîya, di xwîne da sor bûbû û ji kenara derketibû, bi xwîna êzîdîyan çayîr û çîmange av dida.

Wê demê, 70 mêrên gundê me, yên Cercerîsê (niha Dêrik) bi destê begê navheram û leşkerên tirkan hatine kuştinê. Ji wê koma mêran yek tenê sax dimîne. Dibên nayê li ser zar, ka çî îşkence wan êzîdîyan xwarin. Dibên rahnê wan, hêtê wan jê dikirin û destê wan dikirin hundurê wan birînan da.

Belê, wisa jî tê gotinê û hatiya nivîsandinê, ku dema ew begê navheram vedigerê welêt, Evdilmecîd Begê<sup>2</sup> wî digirê, gulên serê fişeqê wî navheramî derdixê, dihelîne û berî gewrîya (qirika) wî didê û dibê: *"Tu ji xwîna ermenîyan têr nebûyî, te xwîna êzîdîyên birayên me jî vexwar, de vê qela (kela) gulên xwe vexwe, ji bo ku belkî tu têr bibî"*.

Ev yek tê gilîkirinê, qala vê yekê tê kirinê, ku ev yek ticara nayê ji bîrkinê, wisa jî nayên ji bîrkinê qencîyên gelek kurdên musulman yên xwîna xwe dane li ber çavên xwe û ermenî û kurdên êzîdî rizgar kirin.

---

<sup>2</sup> Evdilmecîd Begê xwarzîyê êzîdîyan bû.

Tê gotinê, ku gelek serokeşîrên kurdên musulman nedixwestin êzîdî koçberbin, herin, destê xwe ji axa kalûbava, axa Kurdistanê bikin. Dibên: *"Ewana ji mirina xwe razî bûn, bi çûyîna êzîdîyan ji welêt ne razî bûn"*.

Di destpêka qirna 20'an da pêwendiyên di navbera êzîdîyan û ermenîyan da xurt bûn û çiqas diçû xurt dibûn.

Du caran; di sala 1908 û 1918'an da ewladê Mala Mîrên Êzîdîyan, Îsmâil Begê li tevî qewalan tê Ermenistanê û Gurcîstanê, ji aliyê serokên ermenîyan û gurcan yên olî va, wisa jî ji aliyê wekilê Împêratoriya Rûsa û berpirsyarê Pişqavqazê Voronsov – Daşkov va tê pêşwazîkirinê<sup>3</sup>.

Di 1920'an da Mîr Îsmâil di name/daxuyaniya xwe da ya li ser navê Katoxîkosê ermenîyan şandibû, dinivîse: *"Civaka êzîdî, ku ji nû va çavê xwe bi xêr û xweşî vekirîye, lingê xwe di şimîka xweşbextiyê da kirîye xwarê, spasiya xwe ji Cenabê We û netewa ermenî ra îlan dikê, ji bo xemxurîyê, xemxuriya wek xemxuriya bavê ber bî ewladên xwe..."*.

Bi destê berpirsê dêra ermenîyan, di Mûsilê da, tê nivîsandinê û şîrovekirinê, ka bi çi şêweyî û bi çi xemxurîke mezin va, Îsmâil Beg û êzîdîyên Çiyayê Şengalê, wisa jî êzîdîyên Şêxanê bi serokatîya Meyan Xatûnê, 11.000 ermenîyên ku osmanîyan bi wateya sirgûnkirinê dixwestin bikuştana, rizgar kirine<sup>4</sup>.

Di 17.Sebatê sala 1917'an da şerekî dijwar di navbera êzîdîyên Mesopotamîyayê û osmaniyan/Roma Reş da derdikevê.

Heka ku alîkarî û piştevanîya eşîra Zêbarîyan, Barzanîyan, Soranan û eskerên înglîz ne bûye, êzîdîyên Mesopotamîyayê wê ji komkojiyê ra wek ermenîyan, rû bi rû bimana.

Piştî salên 1920'an eleqetî û peywendiyên kurdên êzîdî û kurdên musulman, wisa jî eleqetiyên kurd - ermanî bi tomerî ber bi xêrê va çûn û xweş bûn.

---

<sup>3</sup> Elî Begê kuramê Çolî Begê bû û Çolî Begê bavê Îsmâil Begê bû. Elî Begê bi keça Çolî Begê Meyan Xatûnê ra zewicî bû. Elî Begê bapîrê Tahsîn Begê bû. Dema ku Elî Beg kirasê xwe diguhêzê, diçê li ser dilovanîya xwe, hingê lawê wî Seîd Begê bavê Tahsîn Begê 7 salî bûye, ji ber wê yekê jî Îsmâil Begê di dewsa apê xwe da (kuramê bavê xwe da) wek mîrê Êzîdxanê tê hilbijartinê.

<sup>4</sup> Hêjayê gotinêya ku nivîskarê xwedîyê van rêzikan romanek bi navê "Çiyayê Şengalê" li ser vî şer û berxwedana êzîdîyên Çiyayê Şengalê ji bo parastina ermenîyan li himberî osmanîyan nivîsîya, lê mixabin hê nehatîya neşirandinê (çapkirinê).

Di sala 1919'an da peyman a hevkarîyê di navbera kurdan û ermenîyan da, li Parîsê li Fransayê di navbera alîyê şandeka kurdan, Şerîf Paşa, û aliyê dêlêgasîyona ermenîyan da, Poxos Nûbar da, hat îmze û mor kirinê. Her dû alî li ser wê bawariyê bûn, ku pirsgirêka ermenîyan û pirsgirêka kurdan bi rêya aşîfîyê û bi rêya hevkarîyê wê bê çareserkirin. Ermenîyan dixwest wek cînar, ne ku hukumata tirkî, lê ya kurdan bidîta.

#### **4. Ermenîstan wek merkez û paytexta çand û hunera kurdî**

Di salên 1920'an da, li Ermenîstana Azad dergehên dibistana/qutabxana, xwendîgeh, teknîkûman, zankoyan, zanîngehan li ber zarok û ciwanên kurdên êzîdî û kurdên musulman fireh û bi merdane hatin vekirinê.

Yên ku zarokên xwe nedîşandin dibistanê, dihatin cezakirinê. Pêşîyê biryar hate derxistinê, ku xwendina 7 sale, paşê ya 10 sale, ya navendî, pêwîst bû, ku gişt zarok bistînin.

Di zanko, înstîtût û xwendîgeh da, ciwanên kurdên êzîdî û kurdên musulman, bi qalên nimiz (nizim), carina jî bê îmtîhan û bê cêribandin dibûn xwendekar, telîb.

Di salên bîstî da Erebe Şemo Şamîlovê êzîdî û Méragûlovê aşûrî alfabet a kurdî li ser bîngeha tîpê latînî hazir kirin. Ev alfabet a mahneya dengên kurdî baş derdixê.

Cara yekem di cihanê da, li Ermenîstanê, zarokên kurd karibûn di dibistanê da fêrî/hînî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bibin.

Di salên 1920'an û 30'an da, piştî binketina şoreşa Şêx Saîd û serhildana Çiyayê Agirîyê gelek kurdên musulman yê ji dest xezeb, zor û sexta hukumata Tirkiyê bazdabûn, li Ermenîstanê bi star bûn.

Heta salên 1960'an li Ermenîstanê payê pirê (piranî, axlebe) di dewsa "zimanê kurdî" da "zimanê kurmançî" dihat gotin û nivîsandin. Mahneya "kurmanç" bi şîrovekirina hinek zanîyaran ev e: kur(d) – manç(ç), ango lawê kurd. Piştî mirina Stalîn di dewsa "kurmanç" da êdî "kurd" hat xebitandinê.

Di her gûndekî kurdan da jî xeynî dibistanê, wisa jî merkezên rewşenbîriyê/edebê/kulturê tên avakirinê. Di wan merkezên da pirtûkxane, koşka sînemayê, salona xwendinê, goşê sor ji bo mijûlîya mezinan (kişit, nerdî, domîno...) û ji bo zarokan (leystikên zarokan) hebûn, hatine

avakirinê. Di her gundekî da, mêrgûzara sportê, baxçên zarokan/xwendehgehên destpêkê, himam, dikan û di hinek gundan da jî destçêxane û kargeh hatine avakirinê.

Mamostayên gundên kurdan dupa (axlebe, xasima) kurd bûn. Mamostayên zimanê kurdî xwendinxana/têknîkûma kurdî xelas kiribûn. Piştî salên 1960'an kurdên herî feqîr xaniyên yekqat yê moder ji bo xizanê xwe ava kir, yên zengîn xaniyê 2 – 3 qat, xaniyên wek birc û qesiran ji bo neferên xwe ra çê dikirin.

Di navbera salên 1960'an heta salên 1990'an da Ermenistan bû merkez, paytexta zimanzaniya kurdî, zanyariya kurdî, rojnamegeriya kurdî, şoreşgeriya kurdî.

Rojnama "Rîya Teze", rojnama kurdî ya herî emirdirêje û her kes nas dikê.

Dengê radyoya Yêrêvanê bi zimanê kurdî her kesî bihîstiye.

Nav û dengê beşa kurdzaniyê ya Akademîya Ermenîstanê ya Netewî ji her kesî va eşkere ye.

Di Cihanê da tîyatroya kurdî ya yekem li Ermenistanê hatîye damezirandinê.

Di Yekîtiya Nivîskarê Ermenistanê da beşa nivîskarên kurd hebûye û niha jî heye û niha jî pirtûkên nivîskarên kurd têne çap kirinê. Van paşwextiya (dema dawî da) du pirtûkên helbestvanê kurd Elîxanê Memê û du pirtûkên nivîskarê kurd Emerîkê Serdar hatine çap kirinê.

Navên ku her kurdek dikarê pê şanaz û serbilind bibe ew navên ronekbîrên kurd yên Ermenistanê ne. Wek nimûnê, em çend navan têkine bîra xwendekaran:

Nivîskar, zanîyar û profesor Heciyê Cindî, nivîskar Erebe Şemo, profesor û zimanzan Qanatê Kurdo, doktor, zimanzan û dîrokzan Emînê Evdal, profesor, bijîşk (doktor) û nivîskar Sehîdê Îbo, nivîskar û rojnamenûs (rojnamevan) Xelîl Mûradov, nivîskar û rojnamenûs Mîroyê Esed, nivîskar Aramê Çacan, nivîskar, siyasetvan û dîrokzan Nado Maxmûdov, helbestvanê kurd; Wazîrê Nadirî, Casimê Celîl, Şikoyê Hesên, Fêrîkê Êsib, Mîkailê Reşîd, Simoyê Şemo, Qaçaxê Mirad, Eliyê Evdilrehman, dîrokzan û profesor Şerefê Eşîr, doktor, siyastvan û dîrokzan Xalit Çetoyêv, doktor û dîrokzan Memoyê Xalit û gelekên din.

## **5. Hilweşîn, kambaxbûna Yekîtiya Sovyetîstanê û halê kurdên êzîdî**

Di sala 1990'an da Yekîtiya Sovyetîstanê hildişiya, kambax dibû û çawa her cumhûriyetek (komarek) û otonomîyek, wisa jî herdû cumhûriyetên ermeniyan; Ermenistan û Qarabax

dixwestin, ku zûtirkê ji bin nîrê Împeratoriya Sovyetîstanê derên, Ermenîstaneke yekgirtî, azad, demokrat ava bikin. Lê ji ber ku Qarabax di bin du nîran da bû; di bin nîrê desthilatdariya Yekîtiya Sovyetîstanê û ya Azerbeycana wê demê ya komûnîst da bû, bi mecbûrî, divîyabû ermenî bi du pêşenya va berxwe bidana.

Di navbera herdû cumhûrîyetên ermeniyan da di salên 1920'an da statûseke otonomî ya kurdan bi navê "Kurdîstana Sor" hatibû damezirandin. Paşê azerîyan statûya komara kurdan hîç kiribû û ew ax ji xwe ra helal kiribûn.

Kurdên êzîdî vê carê jî pişt dane pişt ermenîyên bira û di erefê qada mîrxasiyê da sekinîn. Êzîdîyan îlan kirin, ku bi malên xwe, bi canên xwe va li gel ermenîyên bira ne. Kurdên êzîdî lawên xwe li rex lawên ermeniyan xistin û şandine ku sînor/hidûdê axa ermeniyan biparêzin.

Rewşenbîr, ronakbîrên kurd û civaka kurdên musulman li ser wê fikrê bûn, ku piştgirîya ermenîyan girtin tişteki mihîm e û pêwîste ku ewana jî alîkarîya ermenîyan bikin.

Serokê hukumata Ermenîstanê û partiyên ermeniyan yê bi hêz jî, di hindava xwe da hazir/amade bûn ku gûh bidin ser rewşenbîrên kurd.

Armanca ermenîyan zelal bû; azadkirina herdû komarên xwe û wek cînar di navbera herdû perçên axa xwe de kurdên dost bibîne, ango Kurdîstana Sor.

Armanca ronakbîrên kurd yê li Ermenîstanê jî zelal bû; xurtkirina bawariyê di nav millet da, ji bo ku millet rêya koçberiyê nedê pêşîya xwe, piştgirîya kurdên Kurdîstana Sor kirin, ji bo ku ewana li ser axa xwe azad bijîn.

Rewşenbîrên kurd rêxistinên xwe damezirandin û dest bi peywendîyan kirin li gel rêxistinên ermenîyan û serokatîya hukumata ermeniyan.

Di sala 1990'an da konferanseke kurdî ya navnetewî bi navê kultûr û lîteratûra/edebî yê û wêjeyî li Moskvayê hate damezirandin. Lê ew civîn bû ya siyasî. Wekilê gelek partî û rêxistinên kurdewariyê beşdar bûn. Beşdarê wê civînê wisa jî Dr. Ebdûrehman Şerefkendî, Dr. Ebdûl - Rahman Samî Şengalî û gelek siyasetmedar û ronakbîrên me yê navdar.

Hinek rêxistinên ermenîyan yê rasîst navê kurd heram kiribûn, qet nedixwestin peyva kurd bibihîzin.

Mebesta serokên partî û rêxistinên faşîstên ermenîyan eşkere bû. Axa Ermenistanê pêşiyê ji kurdên musulman û paşê jî ji kurdên êzîdî paqij bikin. Gilyê (siloxan) wan ev bû: *"Ermenistan tenê ji bo ermenîyan"*

Ji bo ku ewana bigihîştina armanca xwe, xwestin birakujiyê di navbera kurdan da çê bikin.

Armanca nîvxwendî, nezan, kûtparastên me; dixwazê ber ew êzîdî an jî musulman bê, zikê xwe têr kirin bû, kûtê xwe genî kirin bû.

Kûtparêzên êzîdî bûn hevalbendên nijadperestên ermenîyan, kûtparêzên kurdên musulman berjewendiyên kurdên Kurdistana Sor pêpez kirin û çûn gihîştine azerîyên musulman. Birrek ji rewşenbîrên me jî revîn.

Rewşenbîrên kurd, ku ji 100'î 90'ê wan kurdên êzîdî bûn, ewana sîng û milên xwe dane ber gulên birakujiyê, gelek ziyarê dîtin, lê nehîştin kurd xwîna kurdan birijîne.

Milet pey rewşenbîran diçû, millet guh nedida xwefiroşan, kesekî nedixwest barke, here.

Ronakbîran dixwest dostaniya ermenîyan – kurdan xurt bike û bibe pireke bi hêz di navbera Kurdistana Azad û Ermenistana Serbixwe da. Lê mixabin hinek rewşenbîr ji ber sextekarîya desthilatdarên Ermenistana nû, yê di siyasetiyê da pêxas û nezanê me, bazdan, revîn.

Lê belê nijadperest nedihatine rayê, hukumdarê Ermenistana serbest cihêl bûn, xişîm bûn, hê di soba siyasetiyê da qal nebûbûn, soz û qîrarên mezinên xwe û rêberên netewa kurd û wisa jî oldarên xwe û êzîdfîyan nedixwendin, ji ber ku dem û zemanê wan ne bû ji bo xwendinê û dem - zemanê wek zêrê zer, dem û zemanê ji bo çareserkirinê, serrastkirina pîrsgirêkên pêwîst wînda bû, 4 sal bandilhewa wînda bû.

Di sala 1994'an da Kurdistana Sor bi navê "Repûblîka Laçînê" hate îlan kirinê. Wê demê li nik serokkomarê Komara Laçînê, Wekîl Mustafayêv, kurdekî musulman jî, ne ji yê nîşteciyan Laçînê, ne jî ji derveyî Laçînê, tikes nebû. Li rex birêz Wekîl Mustafayêv kurdên êzîdî sekinîbûn û amade bûn ku ji bo xîret û namûsa kurdewariyê xwîna xwe birijînin.

Di navbera wan herçar salan da, ji sala 1990'an, ji sala destpêka serhildanê û heta sala 1994'an, sala îlankirina Kurdistana Sor, nezanên me û rasîstên (nijadperestên) ermenîyan bê kar û xebat neman û di gelek tiştan da bi ser ketin. Çima?

Ji ber ku rev ket nav millet. Di salên 1990 – 1994an da, ji kurdên musulman 100î 90, ji kurdên êzîdî 100î 40 - 45 koçber bûn.

Erê, bûyerên neqenc (kirêt); kuştin û girtin jî qewimîn. Lê rewşenbîrên ku mayibûn nehîştin gilî (rewş, gazin) mezin bibin.

Belê, milletê ermenî, netewa ermenî dost e, dostê me kurda ye, ew ne dijmine, lewma jî millet nedixwest ku destên wî û dosta bikeve qirika hev. Nijadperestên bêhiş û xwefiroşên me yên tima û nezan bûn hacêt di destê xelqê da, di destê xêrnexwazên kurdan û ermeniyên da. Dijminê netewa kurd û netewa ermenî ranezane, ewana tim hişyarin.

Herweha Komara Laçîn negihîşt wan nêt û merema xwe, wan armancên ku ew ji bo hatibû damezirandin, ji ber ku piştî wan kesên ku dixwestin ew kar bikirina hatibû valakirinê.

Hinek ronakbîr mayibûn. Ewana şev li xwe kirin roj, roj jî kirin şev. Komelên dostaniya ermeniyên – kurdan hatin damezirandinê. Yekîtiyên bijîşkî hatin damezirandinê. Yekîtiya rewşenbîra hata damezirandinê. Ewana milên xwe dane milên hevûdin, nehîştin ku ocaxên edebiyetê, ronakbîrîyê, zanyarîyê, yên kurdewarî bîn kilîtîkirinê.

Niha jî ewana di nav millet da xebatê dikin. Seheta wan xweş. Emekê wan tucar millet ji bîr nakê.

Kurdên êzîdî û kurdên musulman di dema şoreşa ermenîyan ya ji bo serxwebûnê gelek kar û xebat kirin. Tenê êzîdîyan 33 şehîd dan.

Lê faşîstên ermenîyan heta niha jî nahewin, ewana dawîya dawî dev kirine cegera êzîdîyên hevalbendên xwe da jî, bi navê şexsî, çiya û zozan jî kirin yên şexsî. Ewana destûra êzîdîyan nedidan ku pez û dewarên xwe biçêrînin. Ewana xelk talan dikir, niha jî talan dikin. Ewana xelk eblûqa dikirin. Ewana xwe bi xwe bi xelkê me yên xalîfî, nezan dikenîyan û digotin, ku bala xwe bidinê, bi xwe dixwazin xwe bikin ermenî, di pirtûk û mijarên xwe da dinivîsandin, ku em, êzîdî armênoîdin, lo. Ewana niha jî dest bi kuştina êzîdîyan kirina (çavkanî: [www.ezid.ru](http://www.ezid.ru)). Lê kuştina dostan, gengeşîya di nav dostan da, tik û tenê karê dijmin e.

Niha li Ermenistanê, bi dîtina min, dibe ku 13 – 15000 êzîdî mayibin, nîvê wan jî dev ji dîn û hebandina êzîdayatîyê berdane, bûne Peyatîyên Yahova (Şahîdên Yahova), û diçin li ser dîn û mesebên dîn û navê xwedênasa jî datînin li ser xwe. Lê ew dîn û hebandin ya ermenyan nîne, ya xaçparêzan nîne, ya Xwedênasiyê nîne.

## **6. Mafê penaberîyê û rewşa êzîdîyan ya îroyîn/evroj**

Belê, rewşa êzîdîyên Ermenistanê û ne tenê yên Ermenistanê, lê êzîdîyên li temamiya komarên serbest û nîvserbest da, yên ku piştî hilweşin, kambaxbûna Yekîtiya Sovyetîstanê derketine holê, ne başe.

Halê cimaetê, halê millet, di destê nijadperestan, polîs, mafîya da, ne tu hal e.

Li Rûsîya û ciyên din gelek ciwanên me zeyî dibin (tên windakirin); tên kuştin, dikevîne hepsa. Berîya çendekî, bi çiyê ne tûyî, ciwanekî me di metroya Moskvayê da, ji aliyên nijadperestên ûris va, hate kuştin (êzdîxane.ru). Gelek kurdên êzîdî û kurdên musulman, ev 15 – 16 salin li Rûsîya dimînin, lê mafê peneberiyê nedane wan, nasnemên geleka tunene, wan bi paşda dişînin Ermenistanê û Gurcistanê. Li navça Krasnodarê ya Komara Rûsîya Federal da kozaka (qozaqa) mefer ji kurdên êzîdî û kurdên musulman birîne, nahêlin ewana pakî bêhna xwe hilkişînin. Erê, rêxistinên kurdan li wir hene û ji mecbûrî hewara xwe digihînin balyozxana (sefaret, konsolosxana) Amerîkayê û daxwaz dikin ku li wan xwedî derkevin û mafê penaberiyê bidin wan. Di derbarê vê yekê da malpêra [www.ezdixane.ru](http://www.ezdixane.ru) û dezgeh/alavên ragihandinê yê Rûsîya gelek caran agehdarî dane.

Di van rojên dawî da malpêra [www.ezid.ru](http://www.ezid.ru) ragîhand ku: *“Kurdên Ermenistanê bi qezîya koçberiyê ra rû bi rû mane. Kurd ji mecbûrî heywanên xwe difroşin û ji Ermenistanê koç dikin. Sedem ew e, ku desthilatdarîya Ermenistanê zozanên kurdan derxistine mazetê (pîyasê)”*, û li gor gotina serokê “Şêwra Êzîdîya ya Netewî” Ezîzê Emer, hinek ermenî li gundên kurdên êzîdî digerin û ji wan re dibêjin: *“Divê hûn ji Ermenistanê derên, Ermenistan ya ermenîya ye û tenê divê ermenî li vir bijîn”*. Van axrîya nijadperestên ermenîyan, li Ermenistanê, li gundê Zovûnî mêrekî êzîdî bi lêdanê kuştin. Jina wî û zarokên wî jî ji bo ku vê bûyera kirêt protesto bikin li ber dergêhê desthilatdarîya Ermenistanê (parlamentoyê) xwe şewitandin ([www.ezdixane.ru](http://www.ezdixane.ru)).

Belê, li welatên azad û demokrat jî, gelek êzîdîyên ji Ermenistanê û Gurcistanê mafê penaberiyê nastînin û li vir jî dero – dero dibin.

Li vir êzîdîyên ji Ermenistanê wek ermenî tên naskirinê, yê Gurcistanê wek gurec, yê Qazaxistanê wek qazax... Belê, statûyek ji bo êzîdîyan nîne.

Ew êzîdîyên ku berîya 90 salî destên xwe ji welatên xwe, zîyaretên xwe kirine, li temamiya cihanê bela-wela bûne, bê nasnamene, bê statû, çawa tê gotinê: *”Ne Îsa li me dibê xweyî, ne jî Mûsa”*.

Hejmara êzîdîyên penaber, lê bê mafê penaberiyê 100 – 150.000 e. Hejmara kurdên musulman yê penaber jî dibe ku hê gelek be. Axrî û aqûbeta wan, yazî û miqedera wan, maf û çarenûsa wan wê çawa be?

Belê em gişt ji oleke kurdewariyê ne, ji civakeke kurdewariyê ne, em Kurdistanî ne.

Belê, min ji devê Serokatîya Kurdistanana Azad, ji dûrdîtinokê (tv) bihîsk, ku Kurdistan amade ye ku kurdên ji Yekîtiya Komarên Sovyetîstana Berê wek pênaber star bikê. Lê çiqasî ev ji me ra eşkere ye, ew kar û xebat pêş neketîye.

Divê statûya me, nasnama me, bi giştî, li Kurdistanê bê îlankirinê.

Divê mafê me, destûra me, bi giştî, li Kurdistanê bê parastinê.

Divê em bibin pişt ji bo Kurdistanana Azad. Kurdistan perûbaskê me giştî ye. Kurdistan dayîka me giştî ye. Kurdistan welatê me giştî ye.

Divê em ji Kurdistanana Azad ra dostan çar (peyda) kin, wisa jî dijminê me pirin, çîqa hene, bese.

Divê em qedrê Mala Mîrê Êzîdîyan bigirin. Ew mal ji bo me giştî sîmboleke mêjûyî ye. Ew mal û ewladên wê malê; Mîrê Êzîdîyan Mîr Tahsin Seîd Elî Beg, birayên wî, birazîyên wî, xwarzîyên wî, milletê wî, di nava Şoreşa Îlonê da bûne û heta xelasîyê li gel Barzanîyê Nemir bûne. Niha jî birazîyê Mîr Tahsin; Kamuran Xeyrî Seîd Elî Beg, ku hiqûqnas e, zane ye, nîştimanperwere, bi dil, bi can, bi mal, bi milk li gel Serokatîya Kurdistanê ye.

Divê Mala Mîrê Êzîdîyan jî, çiqas ku qeweta wan digihîjê, hêza wan têra wan dikê, xwedî li wan 100 – 150. 000 êzîdîyên penaber derkevin. Ne, heka ku halo berdewam bike, wê civaka me bihelê û bibê Yêgovîst, Yêvangêlîs hwd.

Divê civaka êzîdî rêxistinên nûjen ava bikê, zanibê demokratî, azadî, mafparastin çî ye û çî nîne û xwedî li mafê xwe derkevê. Em kurdên êzîdî yên Yekîtiya Sovyetîstana Berê û em kurdên êzîdî yên li Başûrê Kurdistanê (Îraqê) di bin nîrê dîktatoriyê da mezin bûne, ji me ra zehmet e ku fêrî demokratîyê bibin, lê hînî demokratîyêbûn bi rêya dîyalogê bi tevî hev axavtin pêwîste, pir muhîme. Demokratî û dîyalog ev e rêya me. Rêya çareserkirina pirsgerêkan, kêşe ya.

Belê, bi dîtina min, bê gûman êzîdîyên Çîyayê Şengalê, Çîyayê Meqlûbê, Çîyayê Başîqê û Behzanê û bingehên êzîdîyan yên din, dixwazin li gel hev bin, di nava goveka, çarçova hukumatekî da bin û ew hukumat jî divê Kurdistanana Azad bê.

Ew tiştên ku êzîdîyan di van 20 – 25 salên dawiyê da ji destê Saddamê dîktator û baasîstên xwînxwar dît, ew yek heta kurê kuran sax bin besî wan e û nayê ji bîr kirin; ji xeynî vêca kuştin û girtina bi dehhezaran êzîdîyên am û tam, hilweşandin û kambaxkirina bi hezaran gûnd û bajarên êzîdîyan, baskekî Çîyayê Şengalê jî jê kirin û kirine milkê xwe. Çîyayê Şengalê cîyê cinetî ye, her tişt li wir şîn dibe, gelek qesir û ziyaretên qedîm li wir hene, gelek mêrên bi xîret, û bi namûs li wir dijîn...

Belê, êzîdî hêzeke xurte, weke milyonek – milyonûnêvekî êzîdî di cihanê da hene û ji wan 850 – 900 000 li Başûrê Kurdistanê yê Mezin û li Başûrê Kurdistanê yê Biçûk (Binxetê) dijîn.

Li Başûrê Mezin, di dewir û zemanên kibîr da, bingeha êzîdîya hebûye û heye. Kurdên êzîdî bi zor û belakê karibûne Mîrîtîya xwe biparêzin û bînîn derxine heta roja îroyîn.

Raste, ji ber sedemên cudacude Mîrê me, Mîr Tahsin heta vê gavê jî penabere, lê qesra wî li bajarê Şêxanê ye û şundarê wî, Mîr Kamuran li bajarê Bahadrê rûdinê, Mîr Faroq jî li Mûsilê rûdinê. Li bajarê Şengalê qesrên Mîr Îsmâil û Mîr Seîd hene, lê ereba ew kambax kirine. Qesra Elî Begê Mîrê Mîran li Bahadrê ye.

Tifaqa êzîdîyan heye. Êzîdî qencî û xerabiya xwe pir- hindikî (kêm-zêde) zanin, bi xîret û namûsin, zane ne, lê wek zarokan dilsafî ne, dilsozin. Eger êzîdî di civînên xwe da gelek caran peyva "tifaqê" tînine ziman, dive kesek jê aciz nebê, ew tifaq li dijî tu kesî nîne. Êzîdî di dewr û zemanan da dilsoz bûne, ji aramî û aşîtyê hezkirina. Bê sebeb û bê sedem kişî mirîşkên tu kesî nekirine.

Bi nêrîna min, qeweta êzîdîyan, hêza êzîdîyan, ew qeweta kurda, hêza kurda bi giştî ye û divê em wê hêze bêrûmet nekin û xwedî li wê hêze, wê qewetê derkevin.

Nû, a niha, hema di vê demê da dahwe û doza cudatîyê û cihêbûnêkirin di hindava ne ku tenê êzîdîya, lê her ol, eşîr, di civakeke kurdewariyê da, ew wek kapê xezebê ye. Ji cûdatî û cihêbûnê ra divê her êzîdîkek bêjê na. Mirin û jîyana me divê li gel, bi tevî birayê me, kurdên musulman be, ji ber ku netewe me kurdîyê, lê em xwedî olên cûda ne.

Nû, a niha, hema vê demê, ku me ji hev hez nekir, qedrê hev negirt, qedrê rabûn û rûniştina hev, qedrê devok û zaravên hev negirt, wê êdî tu karê me bi pêş va nekevê.

Nû, a niha, hema vê demê, eger me hev gewre, bi hêz nedît, siba wê dereng bê.

Gûman heye, ku rewşa êzîdîyan li Ermenistanê ber bi xêrê va herê, eleqetî û peywendiyên kurd û ermenîyan ber bi xêrê va herin, ji ber ku helwest û mebestê tirkan û baasîstên ereban eşkere ne û daxwazên wan ne di berjewandîya netewên kurd û ermenîyan de ne.

Divê Ermenîstana Azad û Kurdistana Azad destê dostaniyê û biratîyê dirêjî hev bikin. Peymana 1919'an ya di navbera kurd û ermenîyan da hê kesekî hêç (pûç) nekirîye û divê peymanek nû di navbera kurd û ermenîyan da bê girêdanê, lidarxistinê.

Bawariya min heye, ku wê di Destûra Kurdistana Azad ya Bingeîn da mafên kurdên êzîdî, ku çawa pêwîst e, wê wisa jî bên parastinê.

Bawariya min heye û ez bi hêvî me, ku piştî rapirsîn/referandûma payîza 2007'an, wê bingehên êzdîyan: Şengal, Başîq û Behzan jî di nava Herêma Kurdistanê da cî bigrin. Nû, a niha bi şewekî din çê nabe!

Perçebûna bingeha êzdîyan ne ji êzdîyan ra û ne jî ji netewa kurd bi giştî ra dest dide.

Ez bi hêvî me, ku wê Kurdistanê Mezin, Azad û Demokrat di demek ne dirêj da bê avakirinê û wek cînareke xêrxwaz li rex Ermenistana Mezin, Azad û Demokrat bê. Ev yek daxwaza mêjûyî ye, daxwaza ronakbîrên ermenî û kurd e, daxwaza netewa kurd û netewa ermenî ye, daxwaza xelkê cihanê, yên azad û demokrat e.

Bê şik, zimanê kurdî, ne ku zimanê sormancî, hormancî, gormancî, dimilmancî, sorgorî... wê wek zimanê netewa kurd be naskirinê.

Bi nêrîna min, bi dîtina min, êzîdîyên ku dero-dero bûyîne, û ku wek çengek garis li ser cihanê bela-wela bûyîne, wê mafê penaberiyê bistînin û siba dusiba bi tevî Mîrê xwe, wê vegerine Kurdistanê xwe, wê vegerine ber ziyaretên xwe, wê vegerine ser bingeha kalûbavên xwe. Ka kê dîtîyê, ku wê rastî heta hetayê di hepsê da bê?